Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi
Yıl:1, Cilt1, Sayı2, Kasım 2015, ss. 158-182

# STRANA KURDÎ (KURMANCÎ): DEVERA HEKARÎYAN WEKÎ NIMÛNE

## (Kurdish (Kurmanji) Styrene: Hakkari Region Example)

**Yaşar KAPLAN**[1]

**Puxte**

Edebiyata Gelêrî ya Devkî di Edebiyata Kurdî de cihekî girîng digire. Di vê xebatê de em ê dê li ser babeteke edebîyata gelêrî “stran”ê rawestin. Bi awayekî giştî zêdetir xebata me dê sînorkirî bît. Ji bo derêxistina gîvilê (*sîlûet*) edebîyata gelêrî ya Kurdî divêt babetên edebîyata gelêrî berê wekî beş beş bêne nirxandin û her babeteke edebîyata gelêrî li dû belavbûn û taybetîyên wê li ser qada deverekê bêne hilbijartin û lêkolînkirin. Me jî bi navê “Strana Kurdî (Kurmancî): Devera Hekarîyan Wekî Nimûne” de xwest xizmeta ziman û edebîyata Kurdî bikin.

**Peyvên Sereke:** Folklore, Stran, Hekarî, Dengbêj

**Abstract**

Oral Kurdish Folk Literature holds an important place in Kurdish literature. In this study, we have studied “styrene”, which is one of the topics of the folk literature. Our study will be limited rather than a general study. In order to reveal the silhouette of Kurdish folk literature, it is necessary to evaluate the issues of the folk literature section by section, and select and evaluate each subject of the folk literature according to its distribution and characteristics in a region. We wanted to contribute to the Kurdish Language and Literature with our study entitled “Kurdish (Kurmanji) Styrene: Hakkari Region Example”.

**Keywords:** Folklore, Styrene, Hekarî, Minstrel (Dengbêj)

1 Araştırma Görevlisi, Hakkâri Üniversitesi, İlahiyat Fakültesi.

**Özet**

Sözlü Kürt halk Edebiyatı Kürt edebiyatında önemli bir yer tutar. Bu çalışmada halk edebiyatının konularından biri olan “stran” üzerinde durduk. Çalışmamız genel bir çalışmadan ziyade sınırlandırılmış bir çalışma olacaktır. Kürt Halk Edebiyatının siluetinin ortaya çıkarılması için halk edebiyatının konularının bölüm bölüm değerlendirilmesi ve halk edebiyatının her konusunun bir yöredeki dağılım ve özelliklerine göre seçilmesi ve değerlendirilmesi gerekmektedir. Biz de “ Kürtçe (Kurmanci) Stran: Örnek Olarak Hakkâri Yöresi” adlı çalışma ile Kürt Dili ve Edebiyatına katkı sunmak istiyoruz.

**Anahtar kelimeler:** Folklor, Şarkı- Türkü, Hakkâri, Halk ozanı

## 1. Destpêk

Her civakekê ji dema peydabûne xwe pê ve berhemên edebî afirandine. Ji van berheman yên bi devkî û anonîm derketî û belavbûyî yên xudan nirxeke edebî di bin banê edebîyata gelêrî de hatine tomarkirin.[2] Di serê sedsala XIXan pê ve ev malzemeya ziman û çandê ya dewlemend wekî disîplîneke cuda û serbixwe ji alîyê lêkoleran ve hatîne tomarkirin, lêlolînkirin, vavartin û nirxandin. Ev disîplîna serbixwe wekî “folklore” hatiye binavkirin.[3] Em dikarin vê zanista serbixwe ya li ser çand, ziman, edebîyat û kelepora gelekî, bi rêbazên xasî xwe xebatê diket bi Kurdî wekî “gelnasî” bi nav bikin. Ji hîngê were edebîyata gelêrî û gelnasî wekî du dîsîplînên serbixwe li kêleka hev xebatê dikin.

Di Kurdî de jiboher cûre bermayê çand, ziman, edebîyat û bîr û bawerîyên gelêrî peyva “kelepor” tête bikarînan. Kelepor peyveke lêkdayî ye, ji du peyvan pêk têt; “kele” û “por”. Kele; di me’na gelek, pir, zêde de têtе bikarînan. Por jî di me’na “mal, tiştê desketî, bermayê talanî, tiştê bêxudan an jî tiştê ji bo lê xudan derketinê mafê her kesekî heyî” didet. Bi vî awayî kelepor me’na bermayê zêde û pir didet. Em dikarin di bin banê Kelepora Kurdî de bermayên maddî û manewî, çand û zimanî kom bikin.

## Stran

Di edebîyata Kurdî ya devkî de di beşa nezmê de cûreya ji hemîyan dewlementir stran e. Peyva “stran” ji gotina “stirîn”ê têt. Stirîn ji bo gotinên bi rîtm û selîqe têne gotin. Dema em dibêjin stran em heman demî de behsê; lawje, lawik, şeşbendî, narînk, serê zava, miqam, kilam, peste, heyranok, payîzok, berîte, dîlok, dûrik, zêmar, laylayê, serîlêk, delêl, medîhe, qewlêrk û hwd. dikin. Heta niha strana Kurdî bi awayekî rêkûpêk nehatîye vekolîn. Ji bo baştêgehiştina strana Kurdî divêt em stranê bi awayekî zanistî, li çavî daneyên berdest vekolînin. Bo vê çendê jî divêt em stranê bi ser cûreyên wê ve vavêrin. Berî

2 Artun, ERMAN. *Türk Halk Edebiyatina Giriş,* Kitabevi, İstanbul, 2009, ç. 5, r. 261.

3 Artun, ERMAN. *h.b.,* r. 261.

em derbasî cûreyên stranê bibin divêt em derheqê hinek taybetîyên stranê ku cûreyek ji nazmê ye, hinek agahîyan bidin.

Wekî tête zanîn di rêz (*rist*) û malikên (*bend*) stranan de kêş (*wezn*) û qafîye (*serwa*) hene. Herwisa di strana Kurdî de jî kêş û serwa heye. Kêş, sîstema birîtimkirin û hemahengkirina rêz û malikan e. Çimkî bi saya kêşê hejmara kîteyên rêzan hindî hev dibin û ev jî îmkana hemahengîbûna malikan pêktînît. Rêkxistin û lêkdana dengan di her zimanekî de aheng û musîqeyeke taybet çêdiket. Kêş û rîtîm li dor maweyekî destnîşankirî dizivirin û ji tuxîbên xwe derbaz nabin. Kêş û rîtîm bi hevra ahengekê diafirînin û ev çende hozanê ji pexşanê cuda diket.[4] Kêşa strana Kurdî kêşeke xwemal e.[5] Serwa jî lihevhatina dengên dawîya her rêzeke malikê ye. Dubarebûna dengan awazeke taybet bo hozanê çêdiket û bi harîkarîya kêş û rîtîmê ve ahengekê pêk tînît.[6] Ji xwe stran jî, ji bo gotinên bi saya kêşe û serwa û awazê ve hest û boçûnekê radigehînin tête gotin. Divêt em li vê derê bibêjîn ku strana Kurdî hemîyê de kêş nîne. Lê belê strana Kurdî hemîyê de serwa heye.

Di vê dere de em dikarin strana Kurdî di bin banê çar birran de binirxînin. Her birrek jî di nava xwe de dabeşî gelek birran dibît. Li çavî daneyên berdest em dikarîn stranê ji alîyê formen ji hev cuda, ruxsar, naverok û şêweyê ve binirxînin.

## Formên Stranan

### 1.1. Strana Dîlan û Govendan, Dîlok, Dûrik

Ev birr ji stranên di govend û dîlanan de têne gotin pêktêt. Wekî dîlok[7] an jî dûrik[8] têne binavkirin. Ji alîyê hinek stranbêjan ve têne gotin û ji alîyê hinek stranbêjên dî ve jî têne vegêrandin. Bi selîqe û awazên sivik ve têne stirîn da ku govend û dîlan li ber bête gêrandin. Piranîya van stranan ji bendên sê rêzî pêk tên. Rêza her bendeke stranê bi paşbend an jî şerbendê (*naqarat*) ve xilas dibît. Di van stranan de kêşe û serwa heye. Bi awaz û selîqên cuda têne gotin û leyîzên cûrbicûr li ber têne leyîztin.

### 1.2. Strana Dîwankî (Gazî)

Ev birrê stranê ji bo stranên berevajî stranên govend û dîlanan, stranên di koşk û dîwan û civatan de têne gotin, tête bikaranîn. Stranên rûniştinê ne. Stra-

4 Bavê Nazê, *Ferhenga Têrmên Wêjeyî,* Çapxana Hewar, Dihok, 2012, r. 165.
5 Bavê Nazê, *h.b.,* r. 143.
6 Bavê Nazê, *h.b.,* r. 131.
7 Ji bo binavkirina "Dîlok"ê bnr; Mistefa Hesen, *Dîlok, Stranên Dirwîn û Dîlanan,* Weşanên Sipîrêz, Dihok, 2005, r. 5, 6. Çelebî, Nezan Newzat- Yildirim, Vedat- Ataş, Aytekîn G, "Li Muzîka Kurdan a Kevneşopî Nêrîneke Giştî", *Kovara Zend, Bihar- Havîn, 2008.* (Wer. Davut Êzalp)., Cigerxwîn, *Folklora Kurdî,* Weşananên Roja Nû, Stockholm, 1988, r. 8.
8 Salihê Heydo, *Komek Dûrik Ji Folklora Kurdên Suriayê,* Bergê: 3, Enstîtuya Kelepûrê Kurdî, Çapxana Aras, Hewlêr, 2009, r. 11.

na dîwankî ji alîyê kesekî ve tête stirîn. Selîqe û awaza wan giran e û bi awayê gazîkirin û qîrkirinê têne gotin. Ji ber vê çendê di devera Hekarîyan de wekî "gazî" têne zanîn. Piranîya van stranan bi awayekî serbest hatine honandin. Kêşe nîne lê belê serwa heye.[9] Eger di dîwanekê de stranbêjek bendekê bibêjît û stranbêjek dî benda dî jê wergirît hîngê dibêjinê "**gerebend**". Formên lawje, kilam, lawik, payîzok, serêlîk û heyranok cûrên strana gazîyê ne. Di heman demî de formên dî yên mayî yên wekî laylayê, lorik, zêmar û medîheyan hem bi awayê gazîyê hem jî bi awayê strana dîlokê hatine honandin.

### 2.3. Navên Formên Stranan

#### 2.3.1. Dîlok, Dûrik

Herwekî me li jorî behs kir dîlok an jî dûrik stranên dawet û dîlanan in. Govend û dîlan li dû selîqe û rîtma stranê diguherin. Binyatê dîlok û dûrikan li ser malikên sêrêzî ava bûye. Lê belê malikên çarêzî, pênçrêzî, şeşrêzî û yên rêzikên zêdetir hene ku wekî dîloka nijandî tête zanîn jî hene. Ji bo nimûne:

*Sêrêzî*
*Gulbeyaz Gulbeyaz e*
*Mala min Gulbeyaz e (rêza neqaratê)*
*Kulîlka ta evraz e*
*Lawyan da ber miraze*

*Gulbeyazê cihêlê*
*Mala min Gulbeyaz e*
*Rihana têl bi têl e*
*Lawyan da ber simbêlê*

*Gulbeyazê kiçînê*
*Mala min Gulbeyaz e*
*Rihana kate şînê*
*Lawyan da ber rêdînî*[10]

*Çarêzî*
*Şetê Mûsil pan e pismamo lo*
*Şilqedan rexane heyrano lo*
*Dotmama te can e pismamo lo*
*Dil nede xelkane heyrano lo*

---

9 Birastî di piranîya strana gazîyê da jî kêşa xwemalî heye. Lê belê jiborasteronkirna vê mijarê pedivî bi lêkolîn û dûçûnên zanistî û rêkûpêk heye. Ji ber ku ev mijar hêj baş safî nebûye, em zêde li ser ranawestin. Bnr. Rêkêş Amêdî, *Heyranokêd Kurdî,* weşanên Sipîrêz, Dihok, 2010, r. 76- 79.

10 Mela Silêman Tuxîbî (Sûleyman Demir).

*Şetê Mûsil xîz e pismamo lo*[11]
*Şilqan vîzevîz e heyrano lo*
*Dotmama te qîz e pismamo lo*
*Xelkî neleyîze heyrano lo*

*Şetê Mûsil sar e pismamo lo*
*Şilqan tavêt xware heyrano lo*
*Dotmam bo te yar e pismamo lo*
*Ya xelkî ne yar e heyrano lo*[12]

### 2.3.2. Lawje, Kilam

Lawje ji du peyvan pêk têt; law û bêj. Law hem me'na xort, ciwan hem jî di devera Hekarîyan de ji bo bedewî û rindîya zilaman tête bikarînan.[13] Lawje (lawbêjî) hem mijarên mêranî hem jî yên evînî û ciwanîyê di nava xwe de dihewînît. Lawje ji stranên bi awayê serbest hatî honandin pêk têt. Naveroka wan ji evîn, mêranî, cudabûn, xerîbî, taswîra xweza û vegotina rûdanekê pêk tên. Her stranekê navê xwe heye û ji çend bendan pêkhatîye. Di vê stranê de serwa (qafîye) heye. Herçendî hinek deveran Lawje wekî strana dînî bête zanîn jî li devera Hekaryan, Bahdînan û piranîya Botan wekî me li jorî behskirî ne strana dînî ye. Herêma serhedê vî birrê stranê wekî *kilam* bi nav diket. Lê belê di esasê xwe de kilama serhedê û lawjeya Hekarê, Bahdînan û Botan heman tişt e.

*Çendî binazim*
*Ez ebdala Xudê nazêd xwe bo kê kem*
*Teresê teresbabê mêran j'wê ve hat û qutegopalek zenda min dayî*
*Ez ebdala Xudê neşîyabûm lîfika qerepoşîya xwe çêkem*
*Qebeheta darê dinyayê min kirî çi bû çi nebû*
*Şevêdî sêbara şevê mayî kurelawikê delal hate pişt konî*
*Tewafa xal û nîşanêd gerdenê*
*Min ebdala xudê neşîya bêxatir rêkem*

*Çendî binazim*
*Hûn, min ebdala Xudê nenazînin*
*Çengekî mêwîjan biken koşa min gwîzan ber min xişînin*
*Eger ez hayîş nebûm min bikene pişta dadokekê*
*Malêd der û cîranan hûn bigerînin*
*Eger qetûqet ez hayîş nebûm*
*Hûn min mabeyna bûk û zavayêd salê binivînin*

11 xîz: qûm.
12 Kemalê Modayî (Kemal Şimşek)..
13 Di devera Hekarîyan da ji bo rindîya keç û jinan peyva can û ciwan tête bikarînan.

*Çendî binazim*
*Şengenazdaroka malêd baban nazandî*
*Kuriko dîno evî teresê teresbabê mêran destê xwe êxiste gopalekî wergerandî*
*Zend û bazinêd min abdala Xudê şkandî*
*Xizêma kepê min ebdala Xudê livandî*
*Guhara heyderî guhê min bizdandî*
*Destekî minê şkandî yê dîtir yê xilandî*
*Qebeheta darê dinyayê min kirî çi bû çi nebû*
*Şevêdî sêbara şevê mayî kurelawikê delal hate pişt konî*
*Min ebdala Xudê bêhnekê ber xwe da nivandî*

*Çendî binazim*
*Hûn, min ebdala Xudê nenazînin*
*Çengekî mêwîjan biken koşa min gwîzan ber min xişînin*
*Eger ez hayîş nebûm min bikene pişta dadokekê*
*Malêd der û cîranan hun bigerînin*
*Eger qetûqet ez hayîş nebûm*
*Hûn min mabeyna bûk û zavayêd salê binivînin*[14]

**2.3.3. Lawik, Delal**

Strana mêranî, şer û qehremanîyê ye. Ferqa vê stranê digel lawje û kilamî ew e ku leheng û rûdanên mijara vê stranê dîrokî ne. Yanî leheng û rûdanên vê stranê ji alîyê dîrokê ve têne te'yîdkirin, ango xeyalî nîne.[15] Wekî strana Cehwer Axa an Bedirxan Begê. Lawik heman demî de ji alîyê rûxsarê ve xudan taybetîyên lawjeyê ye. Di nav xelkê deştî de wekî delal û di nav xelkê çîyayî de wekî lawik (siwaran) tême zanîn.[16]

**2.3.4. Payîzok**

Payîzok ew stran in ku bi taybetî li devera Hekaryan, Botan û Bahdînan têne gotin. Strana êş, xem, derd, şkestin û hevşanebûnê ye. Wekî tête zanîn payîz, demsala xemê, pîrbûn, mirin, cudabûn û belgwerandinê ye. Di vê stranê de şkestin, reşbînî û bêhîvîyatî serdest e.[17] Dema payîzê gundî û koçer ji zozan û banîyan dizivirin gundî an jî deştê. Rengê xwezayê diguhorît. Herwisa pîrbûn,

14 Mela Tahir Tuxîbî (Tahir Demir).

15 Bnr.; Dr. Selah Hirorî, *Çend Babetên Dîrokî Di Strana Dîrokî Ya Kurdî Da,* Enstîtuya Kelepûrê Kurdî, Silêmanî, 2004, r. 10, 12., Prof. Dr. Şukrîye Resul, *Edebî Folklorî Kurdî,* Dezgay Muzîk û Kelepûrî Kurd, Hewlêr, 2008, r. 114., Rêkêş Amêdî, *b.n.b.,* r. 7.

16 Bnr.; Çelebî,Nezan Newzat- h.d., "mnb.

17 Hecî Ce'fer, *Qevdeka Stranên Folklorî, Li Devera Bahdînan,* Enstîtuya Kelepûrê Kurdî, Çapxana Aras, Hewlêr, 2007, r.5.

ji dilketîya xwe dûrketin jî payîza mirovî ye. Îcar têkçûn û direngman û mirina hîvîyan bi saya gotinan dibin strana payîzokê. Ji bendên cuda û serbixwe pêk têt. Sernavê payîzokan nîne. Bi awayekî serbest û bi serwa têne honandin. Bi selîqeyeke xerîb û dilsoj têne stirîn.

*Wê li min hatî pîrepayîze*
*Çi pîrepayîzeke bi lezûbez î*
*Xemekê avête gulêo, xwîsarê avête herame rezî*
*Memkêd şenge-dostika min*
*Par û pêrar xirkoke bûn kiçkoke bûn*
*Belê salkoka îsal teresbabê mêran yê digezî*[18]

### 2.3.5. Heyranok

Heyranok, ji peyva "Heyran"î hatîye çêkirin. Heyranbûnê îfade diket. Ev e strana evîndar û dildaran e. Keç û kurên evîndar dihavêjin ber hevdû. Hemî naveroka heyranokê li dora evînê dizivirît. Straneke sivik û xweş e. Ji bendên cuda û serbixwe pêktên. Sernavê heyranokan nîne. Bi awayekî serbest û bi serwa hatine honandin. Heyranok bi gazîya kurko dîno! An jî keçkê dînê! dest pê diken. Li Kurdistanê heyranok gelek belav in.[19]

*Kurko dîno,*
*Ev şev çi şev e*
*Pezê babê min yê girtî reve*
*Xwezî ez bibama berxekî sava*
*Bin kepenê heyranê xwe ve*

*Keçkê dînê,*
*Çîyakêd me ji befrê kerr in*
*Ferşêd kanîyan ji xwîsarê terr in*
*Mabeyna min û şenge-dostika min*
*Kaxez nahên û mektûb nagerin*[20]

### 2.3.6. Şeşbendî, Berîte

Hem ji alîyê rûxsarê hem jî ji alîyê naverokê ve straneke bi hêz e. Naveroka wê ji mijarên cûrbicûr pêk têt. Şeşbendî bi kêşe û bi serwa ne. Hem ji bo strana bendên wê ji şeş rêzan pêkhatî hem jî ji bo strana bi selîqe û awaza şeşbendîyê ya cuda têne stirîn tête gotin. Di dîwanan de di halê rûniştinê de têne gotin. Çend

18 Mela Silêman Tuxîbî (Sûleyman Demir).
19 Bnr., Rêkêş Amêdî, *b.n.b.,* r. 9- 79.
20 Mela Tahir Tuxîbî (Tahir Demir).

kes dibêjin û çend kes jî vedigêrin. Selîqe û meqamê wê cuda û gelek berketî ne. Rîtm û selîqa şeşbendîyan wekî muzîka dêrê (kilîsê) ye. Ev çende jî di encama pêkvejîna Nestûrî û Kurdên Musilman çêbûye. Selîqa wê giran e. Tenê di Hekaryan ji alîyê Pinyanişîyên Çelê û di Botan ji alîyê Goyan têne gotin.[21]

*Ez çûme nava rezî*
*Min dît yarê gul çandin*
*Enîka zer meydan e*
*Zêr û tît tê alandin*[22]
*Yarka min ji min sil e*[23]
*Herdu çav j'min revandin*

*Ez çûme nava rezî*
*Yarê d'reşînît ave*
*Enîka zer meydan e*
*Zêr û tît d'kevin nav e*
*Yarka min ji min sil e*
*Hilnagirît silave*

*Ez hatim nava rezî*
*Ser xatra te gulçînê*
*Yarê vê d'gel min neke*
*J'dilî bavêje kînê*
*Yarê ser soza xwe me*
*Tu l'min bike yeqînê*

*Ez hatim nava rezî*
*Ser xatra te gulkerê*
*Yarê vê d'gel min neke*
*J'min nebire nezerê*
*Yarê ser soza xwe me*
*Tu l'min bike bawerê*[24]

### 2.3.7. Narînk

Navê xwe ji narînîya bûkan wergirtîye û di van stranan de bi şiklê "narê an jî "narînê" xîtabê bûkê dikin. Ev birrê stranê, ji stranên li ser bûkan têne gotin pêk têt. Dema xenaye bûkê, çûna bûkê, nik bûkê, rakirina bûkê, derêxistina bûkê,

21 Bnr.; Çelebî, Nezan Newzat- hd.; "mnb."
22 tît: parçeyên zêrî yên li ser enî û sîngî ve têne daliqandin.
23 sil: xeyidî.
24 Hecî Reşo Bilêcanî (Reşît Kaçar).

birina bûkê û dema pêşwazîkirina bûkê ji alîyê zava ve têne gotin. Bendên vê stranê ji sê rêzan pêk tên. Di vê stranê da hem kêşe hem jî serwa heye.

*Narînê dayka minê*
*Delalê dayka minê*
*Binive evşev tinê*
*Hinde heta mirinê*

*Kanûn û herdû çirî*
*Kanûn û herdû çirî*
*Şola Xudê hez kirî*
*Day û weled jêk kirî*

*Kanûn û çirî çar in*
*Kanûn û çirî çar in*
*Van seran befir d'barin*
*Narînê roj hejmarin*[25]

### 2.3.8. Serê Zava

Ev birre ji stranên bi zava têne gotin pêk tên. Dema zava diben serşoyê û xena dikin têne gotin. Ji sê rêzan an jî pitir rêzan pêk tên. Bi kêşe û serwa ne û bi selîqa şeşbendîyan têne stirîn. Di halê rûniştinê de têne gotin.

*Sûlavê ser sûlavê, lawo hey lawo*
*Sûlavê ser sûlavê, ......... zavawo*[26]
*Sosina merzê avê, lawo hey lawo*
*Ya şil e ber xunavê, .......... zavawo*

*Sûlavê seran toz e, lawo hey lawo*
*Sûlavê seran toz e, ........ zavawo*
*Bendika nêryê boz e, lawo hey lawo*
*Xatîna bisk aloz e, .......... zavawo*

*Sûlavê seran tezî, lawo hey lawo*
*Sûlavê seran tezî, ......... zavawo*
*Bendika nêryê pezî, lawo hey lawo*
*Xatîna bisk û kezî, ........ zavawo*[27]

25 Fata Seranî (Fatma Ayaz).
26 cihê vala da navê zava têtê gotin.
27 Mela Kerem Seranî (Kerem Sayik).

### 2.3.9. Peste

Peste, di esasê xwe de beste ye. Ev birre ji bo stranên bi kêşe û serwa yên bi harîkarîya amûreteke muzîkê tênê stirîn tête gotin. Bestekarên vê strana honandî kesên dîyar in. Piranîya stranên ji alîyê hunermendên Kurd yên bi amûretên muzîkê ve têne gotin peste ne. Wekî stranên Tehsîn Taha, Erdewan Zaxoyî, Şivan Perwer û hwd... . li Hekaryan û Bahdînan ji bo van stranan peste tête gotin.

### 2.3.10. Zêmar, Pêgotin

Stranên şîn û behîdarîyê ne. Li ser mirî an jî kuştîyan têne gotin. Stranên pêgotinê ne. Hem bi awayê kêşe hem jî bi serbest hatine honandin.

***Bi kêşe***

*Qelender qelender e Huseynê delal*
*Qelender qelender e Huseynê delal*
*Xaliqê mezin ser e Huseynê delal*
*Bo d'girîn dar û ber e Huseynê delal*

*Qesirka rex mizgeftê Huseynê delal*
*Ew birca rex mizgeftê Huseynê delal*
*Ser têt dengê cim'etê Huseynê delal*
*Huseyn e ber xilwetê Huseynê delal*

*Qesirka Huseyn tinê Huseynê delal*
*Ew birca Huseyn tinê Huseynê delal*
*Ser têt dengê xwendinê Huseynê delal*
*Huseyn e ber mirinê Huseynê delal*

*Qesirka rex bêlayê Huseynê delal*
*Ew birca rex bêlayê Huseynê delal*
*Ser têt dengê duayê Huseynê delal*
*Bû keser dilê dayê Huseynê delal*[28]

***Serbest***

*Çûme maqberê marek nivistî*
*Min pê xwe dayê, serê xwe li min guhustî*
*Min got: "erê maro tu çi mar î?"*
*Got: "ez hatime ser û simbêlêd hêj ne ristî*

28 Ebdulqadir Gwîzereşî (Abdülkadir Kizilkaya).

*Çûme maqberê marek razayî*
*Min pê xwe dayê, serê xwe helînayî*
*Min got: "erê maro tu çi mar î?"*
*Got: "ez hatime simbêlêd hêj ne badayî"*[29]

### 2.3.11. Laylayê, Lorik (Stranên Landik/ Dergûşê)

Ev birr ji bo stranên di ber landik (dergûş) hejandinê, zarok nivandinê an jî ji bo stranên hejêkirina zarokan û pêleyîztina zarokan têne gotin. Hem bi kêşe hem jî bi awayê serbest hatine honandin. Hem selîqa giran hem jî ya sivik têne gotin.

***Serbest***
*Layê hey layê*
*Dê landika xwe beme ser banî*
*Ez dê pê dadem tayê kitanî*
*Dê duayekî bikem bo rebbê rehmanî*
*Da babê landikê*
*Xêr û şayî vegerît ji karwanî*

*Layê hey layê*
*Dê landika xwe beme navderê*
*Ez dê pê dadem tayê mêzerê*
*Dê duayekî bikem bo rebbê rehmanî*
*Da babê landikê*
*Xêr û şayî vegerît ji seferê*

*Layê hey layê*
*Dê landika xwe beme zevîyê*
*Ez dê pê dadem tayê kefîyê*
*Dê duayekî bikem bo rebbê rehmanî*
*Da babê landikê*
*Xêr û şayî vegerît ji xerîbîyê*[30]

***Bi kêşe***
*Xudêo xweş xudêo*
*Nede bayê berfêo*
*Nê kurê rêvîngê rêo*
*Dê çît mala xalêo*

29 M. Salih Gwîzereşî (M. Salih Demir).
30 Fata Seranî (Fatma Ayaz).

*Xudêo tu dibînî*
*Rebbîyo tu dibînî*
*Pejanî tê werînî*
*Bikey mû nebizdînî*

*Xudêo jorî malan*
*Rebbîyo jorî malan*
*Pêpkan deye tifalan*
*Pê biçne malêd xalan*[31]

**2.3.12. Serêlîk (Stranên Nêçîrvanîyê)**

Stranên rav, nêçîr û nêçîrvanîyê ne. Bi awayê serbest hatine honandin û bi selîqeya payîzokan têne stirîn. Di serêlîkê de dîyalogên nêçîrvan û nêçîran (pezkovî, xezal, nêrî û bizin) cihekî berfireh digirin. Stran li ser rûdanên trajîk radiwestît. Ji ber hindê bi selîqeyeke dilsoj têne stirîn.

*Eger ez bimirim min nebene nava çi mirîyan*
*Min bibene girê xatûnê mabeyna herdû gelîyan*
*Da sibeyan bête guhê min, teqêna gopalêt şivanan, şireqêna şaxêt nêrîyan*
*Êvaran bête guhê min zirêna mencelûkêt bêrîyan*
*Ser zîyaretê min bibîte daxwaza nexweş û tawîyan*

*Xemik û xîyalêd tajî û tûlan, ji babikêd karan qet venabît*
*Dilo ez pîr bûm, dilê mal xirab qet pîr nabît*

*Hey herê nêrîyo tu bo çi wey hêrî*
*Tu serê seqlanêt jorî têy û rad'westî hindava şkêrî*
*Mîr Mihemed dibêjît ez ne nêçîrvanê pezê kovî me,*
*Aşiqê xanperîyê xudana xizêma zêrî*

*Hey herê nêrîyo maka bizinê*
*Tu serê seqlanêt jorî têy û ji terazinê*
*Xwarina te ji ava gulê ye, vexwarina te ji ava sosinê*
*Eve serê sê şev û sê rojane Cabeka nebixêr wê hatî*
*Dibêjît serdarê hemî nêçîrvanan wê keftîye ber xirêna vê mirinê*

*Hey herê nêrîyo maka karê*
*Tu hêdî hêdî ji kolêt mîranda têye xwarê*
*Di kevîye panava jorî pişteka vê hîsarê*

31 Rehîmaya Cebraîl (Rahîme Öztaş).

*Xwarina te ji ava gulê ye, vexwarina te ji ava gul hîzar ê*
*Eve serê sê şev û sê rojane Cabeka nebixêr wê hatî*
*Dibêjît serdarê hemî nêçîrvanan wê çûye ber ava şarê*

*Nêçîrvanêt me gelek in rabûn vê heyva tebaxê*
*Pişta xwe dane Herekolî berê xwe dane gelîyê Şaxê*
*Eve serê sê şev û sê rojane Cabeka nebixêr wê hatî*
*Dibêjît serdarê hemî nêçîrvanan wê ketîye nava axê*

*Hey herê nêrîyo tu boçi wey damayî*
*Tu ser serê lat û zinaran rad'westî, rudîna xwe d'deye ber bayî*
*Serdarê hemî nêçîrvanan derbeka risasî paş çengê te dayî*
*Eve serê sê şev û sê rojane Cabeka nebixêr wê hatî*
*Dibêjît serdarê hemî nêçîrvanan xatir xwest û dinya hêlayî*[32]

### 2.3.13 Medîhe

Stranên dîn û dîyenetê ne. Li ser medhên Hz. Pêximber, mezinekî dînî an jî babeteke dînî hatine honandin. Herwisa di medîheyan de behsê mirinê, pûçbûna dinyayê, handana xêr û xêratan heye. Piranîya wan bi kêşe ne lê belê nimûneyên serbest jî hene. Ji bilî vane stranên feqîyan yên di medresan de digotin û di ber da dileyîztin jî hene.

*Oy qebro qebro qebro*
*Tijî tozotijî xebro*
*Mêvanê te me evro*

*Qebrê mino teng û tarî*
*Vî dûpişkî gote marî*
*Dê xweyn goştê gunehkarî*

*Hey benîyo mirin heye*
*Qebrê tarî mala me ye*
*Şîn û tazî bê fayde ye*

*Hey benîyo malik wêran*
*Bo xwe bike nedr û xêran*
*Dû têt roja tevr û bêran*

32 Ebdulqadir Gwîzereşî (Abdülkadir Kizilkaya).

*Qebrê mino nav zevîyê*
*Gurzek deyna nav enîyê*
*Ew ezaba cîranîyê*

*Qebrê mino nav du avan*
*Gurzek deyna nava çavan*
*Ew ezaba day û bavan*[33]

### 2.5. Stranên Karî (Strana Helkeftan)

Ev strane ji stranên, di jîyana Kurdan ya rojane de yên li ber karekî an jî kiryarekê têne gotin pêk têt. Karên li ber muzîkê têne kirin çend zehmet û giran jî bin li ber mirovan sivik dibin. Em dikarîn ew karên bi harîkarîya stranan têne kirin wiha rêz bikin.

- Stranên li ber meşkê

*Meşkê mastê mihan tê hay meşkê*
*Cana mastê mihan tê wey jarê*
*Silk û sîr û bacan tê hay meşkê*
*Xwezya mala du can tê wey jarê*

*Meşka min mastê tîr tê hay meşkê*
*Cana min mastê tîr tê wey jarê*
*Silk û bacan û sîr tê hay meşkê*
*Xwezya mala du pîr tê wey jarê*

*Meşka nêrîyê şîn e hay meşkê*
*Cana nêrîyê şîn e wey jarê*
*Van biskan baweşîne hay meşkê*
*Me zozan Feraşîn e wey jarê*[34]

- Stranên paletîyê

*Hoy Elo Elo Elo*
*Genim gêrano Elo*
*Simbêl qeytano Elo*
*Yarê kiçano Elo*

33 Mela Kerem Seranî (Kerem Sayik).
34 Rehîmaya Cebraîl (Rahîme Öztaş).

*Mala Elo kûrê da*
*Genim gêrano Elo*
*Genim deyna çalê da*
*Van kiçikan çav lê da*

*Mala Elo ber palê*
*Genim gêrano Elo*
*Genim îna j'nihalê*
*Elo yarê delalê*

*Elo têt ji coxînê*
*Genim gêrano Elo*
*Firan d'detin qelûnê*
*Elo yarê xatînê*[35]

- Stranên zibareyan (axeban, çulîbirîn, rezkolan)

*Ban hey banê ban hey banê*
*Ban hey banê axebanê*
*Hey kîjê kiras kitanê*
*Hat meheli ramîsanê*

*Ban hey banê banê ber me*
*Ban hey banê axebanê*
*Yêd hatînê zendik nerme*
*Kîja şêxan min lê şerm e*

*Ban hey banê banê yalî*
*Ban hey banê axebanê*
*Yêd hatînê çarde salî*
*Kîja şêxan dê ç(i)me lalî*

*Ban hey banê banê bestî*
*Ban hey banê axebanê*
*Yêd hatînê kemer şkestî*
*Kîja şêxan dê ç(i)me destî*[36]

35 Kemalê Modayî (Kemal Şimşek).
36 Hecî Haşim Seranî (Haşim Kaplan).

- Stranên borî (tatîhunîn)[37]

*Kîsko çêkirî kîsko çêkirî*
*Kîsko çêkirî kîsko çêkirî*
*Tilî û destan dirwar lê kirî*
*Bîjyê bîyanî ber xwe vekirî*[38]

*Kîsko neqşandî kîslo neqşandî*
*Kîso neqşandî kîsko neqşandî*
*Tilî û destan dirwar reşandî*
*Bîjyê bîyanî ber xwe hejandî*[39]

- Stranên destar hêranê (berdestarî)

*Destarê Akrê berîn e*
*.......... xizêm zêrîn e*[40]
*.........dest tê werîne*
*Helal e heram tê nîne*

*Destarê Akrê beraş e*
*........ xizêm qaş e*
*........ qutnî qumaş e*
*........ were temaşe*[41]

- Stranên cohnî û savar qutanê (berdan)
- Stranên mazîçîn û pancarçinînê

*Ha çinê çinê çinê*
*Kîj naçne çinarokan*
*Reşreşka dilê minê*
*Te nadem hindî dinê*

*Pembûyê rex dêrêo*
*Kîj naçne çinarokan*
*Min durî bi kêrêo*
*Bo hevranê xêrêo*

37 bor an tatî keçeya tirkî ye.
38 bîjî: pîç, heramza
39 Rehîmaya Cebraîl (Rahîme Öztaş).
40 cihên vala bi navên keç û kurên gundî ve têne tijî kirin
41 Fata Seranî (Fatma Ayaz).

*Pembûyê rex mizgeftê*
*Kîj naçne çinarokan*
*Min durî bi qudretê*
*Bo hevranê dawetê*[42]
- Berdolavî, ber tevnî

**2.5. Stranên Zarok û Leyîzan**

Ev birr jî stranên zarokan û yên di ber leyîzan de têne gotin pêk têt. Ev birr bi serê xwe mijareke cuda ye. Lew em zêde pê ra naçîn.

**Ji Alîyê Rûxsariyê ve Stran**

**2.1. Strana Bi Kêşe**

Ev cûre stran ji stranên di navbera malikên wê de kêşe û serwaheyî ra têtê gotin. Binyadê strana Kurdî li ser malikên ji sê rêzan pêkhatî ava dibît. Hejmara kîteyên di her rêzeke malika stranê de hindî hev in. Bi selîqe û awazeke sivik têne gotin. Stranên dîlan û govendan, narînk, serê zava, şeşbendî, peste û hinek zêmar, laylayê û stranên zarokan jî bi vî awayî têne vehonandin. Bo baştir têgehiştina vê mijarê em dê ji bo her cûrekî stranê nimûneyekê bidin.

Strana govendê:
*Xizêma min tew**izî** = 7 kîte /a*
*Li ser rûkê qirm**izî** = 7 kîte /a*
*Aqilê lawan d**izî** = 7 kîte /a*

Narînk:
*Narîn çenda bil**inde** =7 kîte /a*
*Bejin şemal û **finde** = 7 kîte /a*
*Paş te xirab bû g**unde** = 7 kîte /a*

Serê Zava:
*Lawkê min tu law**înî** = 7 kîte /a*
*Hej dema jinê t**înî** = 7 kîte /a*
*Sed xêran jê bib**înî** = 7 kîte /a*

Şeşbendî:
*Ez çûme nava rezî = 7 kîte /a*
*Min dît yarê gul **çandin**= 7 kîte /b*

42 M. Salih Gwîzereşî (M. Salih Demir).

*Enîka zer meydan e = 7 kîte /c*
*Zêr û tît tê al**andin**= 7 kîte /b*
*Yarka min ji min sil e = 7 kîte /d*
*Herdû çav j'min rev**andin**=7 kîte /b*

Çar rêzî:
*Mem 'Ebasî, 'Eb**asî** = 7 kîte*
*Rwîs e tana kir**asî** = 7 kîte*
*Day kore bû neny**asî** = 7 kîte*
*Lêda rima elm**asî** = 7 kîte*

Heşt rêzî
*Kurê Îsa pêximber = 7 kîte*
*Rabû dewrê axr**etê** = 7 kîte*
*Bejin rihana şîn bû = 7 kîte*
*Şîn bû baxçê cenn**etê** = 7 kîte*
*Eshaban kir teybîre = 7 kîte*
*Toke jenî qudr**etê** = 7 kîte*
*Kes nizanît bo kê bû = 7 kîte*
*Kefte stukra ne'l**etê** = 7 kîte*

Wekî di nimûneyên jorî de dîyar dibît di vê cûre stranê de hem kêşe hem jî serwa heye. Ev cûre stran bi awayekî kolektîv têne gotin. Yanî ji alîyê herî kêm du kesan ve têne gotin û dîsa ji alîyê herî kêm du kesan ve têne vegêran. Selîqeya awazên van stranan sivik e. Ev sivikbûne îmkana reqs, leyîz û bizavê didet.

**2.2. Strana Serbest**

Em dikarîn vî cûreyê stranê wekî "gazî" bi nav bikin. Çimkî ev stran bi selîqe û awaza giran û dirêj têne gotin. Li devera Hekarîyan wekî "gazî" têne zanîn. Çunkî stranbêj ji bo gotina vê stranê pêdivîyê bêhn û nefeseke dirêj e. Û paşî bi awayê gazîkirinê diqîrît. Kilam, payîzok, heyranok, lawik, lawje û hinek zêmar, laylayê û stranên zarokan bi vî awayî hatine vehînan. Piranîya van stranan li ser malikên sêrêzî hatine avakirin. Lê belê hejmara rêzên malikan gelek caran ji sêrêzan pitir jî hatine avakirin. Heke bendên strana serbest bi dehan rêzan pêk bêt hîngê dibêjine vê stranê "strana nijandî an jî strana çîrokî".

Di strana serbest de serwa (*qafîye*) heye lê belê di navbera rêzên malikan de kêşa wekî kêşa Tirkî (*hece ölçüsü*) nîne. Lê belê em dikarîn behsê kêşa Kurdî ya xwemalî bikin. Herçende hejmara kîteyên her rêzikeke malikê ji hevdû cuda bin jî kêşeke xwemalî heye. Li vê dawîyê piştî kûrkirina lêkolînên li ser folklora Kurdî hate dîtin ku strana serbest ya Kurdî de kêşe heye.[43] Li dû vê boçûnê her

43 Bnr.; Rêkêş AMÊDÎ, *b.n.b.,* r. 66- 69.

rêzeke malika strana serbest li ser rêzên; sê-kîteyî, çar-kîteyî, pênc-kîteyî û heft-kîteyî ava dibin. Rêza malikê ya pêşîyê çend kîteyî bît divêt hejmara kîteyên rêzên malikê yên dî jî an hindî kîteyên rêza pêşîyê an jî qatên wê bît. Bo nimûne heke rêza pêşîyê sê kîteyî bît divêt rêzên dî an sê kîteyî an şeş-kîteyî an jî neh-kîteyî bin. Ev mijar hêj baş serast nebûye hewceyî lêkolînên hûr û kûr heye. Hebûna kêşa Kurdî ya xwemalî îmkana îfadekirina hest, hîs û boçûnan zêdetir diket. Lê belê divêt em vê stranê neşibînin helbesta serbest. Çimkî wekî me gotî di nava rêzên her malikekê de serwa heye. Selîqa stranên serbest giran e. Lew tenê ji alîyê kesekî ve têne gotin. Yanî di vê stranê de îmkana pêkvegotin û vegerandinê nîne.

Lawje, kilam:
*Çendî bi naz im*
*Şenge nazdaroka malêd baban naz**andî***
*Kuriko dîno evî teresê teresbabê mêran*
*Destê xwe êxiste gopalekî werger**andî***
*Zend û bazinêd min ebdala Xudê şk**andî***
*Xizêma kepê min ebdala Xudê liv**andî***
*Guhara heyderî guhê min bizd**andî***
*Destekî minê şkandî yê dîtir yê xil**andî***
*Qebeheta darê dinyayê min kirî çi bû çi nebû*
*Şivêdî sêbara şevê mayî kure lawikê delal hate pişt konî*
*Min ebdala Xudê bêhnekê ber sîngê xwe niv**andî***

Payîzok:
*Wê li min hatî pîrepayîze = 10 kîte*
*Nê min ebdalê Xudê nekirî çi kar û barê van ga û g**êran**= 20 kîte*
*Hey erê nê min got terazî yêd hatne qiblêo = 15 kîte*
*Gelavêjê malikxirab xwe dihelavêjît di nav qembelanekî hûrde st**êran**= 25 kîte*
*Xwezî, sêsed xwezî sala par û pêrar vî demî = 15 kîte*
*Memkêd şenge dostika min xirkoke bûn, girkoke bûn, nermoke bûn = 20 kîte*
*Belê çi bikem vî demê salê =10 kîte*
*Yêd keftî ber benda mal û m**êran**= 10 kîte*[44]
Heyranok:
*Kurko dîno,*
*Dê çîn zozanan pêkve = 7 kîte*
*Dê keprokan pêkve şîn bikeyn, şiqle ser êk ve = 14 kîte*
*Eger me şevê sar bû = 7 kîte*
*Dê xwe kêşîn dev êk ve = 7 kîte*

44 Mela Kerem Seranî (Kerem Sayik).

**Ji Alîyê Naverokê ve Stran**

Çand û kelepora milletekî di heman demê de neynika wî milletî ye. Baştirîn rêka nasîna milletekî girêdayî nasîna çand û kelepora wî milletî ye. Çimkî hemî serûberê milletekî di çanda wî milletî de teşe û dirûv girtîye. Çi gava ew çand û kelepor bi awayekî zanistî bête vekolîn givêlê (*sîlûet*) wî milletî dê derkevît meydanê. Em bi saya çand û kelepora xwe dikarîn hêmanên nasnama milletê xwe derêxîn meydanê. Ji bo pêkhatina vê çendê jî pêdivî bi tomarkirin, sinifandin û vekolînên zanistî yên li ser naveroka çand û kelepora me heye.

Çavkanîyeke strana Kurdî xweşikahîya coxrafyaya Kurdistanê ye. Lew serdestîyeke xwezaya Kurdistanê em di stranê de dibînin. Deşt û zozan, dol û newal, gelî û zinar, çîya û banî, çem û rûbar, kanî û sûlav, com û celal, dar û ber, mêrg û çîmenên Kurdistanê di strana Kurdî de cihekî berfireh digirin. Strana Kurdî li ser jîyana rojane ya kurdawerî ava bûye. Dema em lê dinêrîn dibînin ku ji karên sibê heta êvarê, ji biharê heta zivistanê, jîyana gundan ya rojane, çûn û hatina zozanan, çûna karwanan û têkilîyên bazirganî, xwendin û medrese, mîratî û rêveberî, şer û lêkdanên di jîyana kurdawerî ya klasîk hemî cihê xwe di stranê de girtîne. Çanda Kurdan ya maddî û manewî herwisa cihê xwe di stranê de girtîye. Bi saya stranê em dikarîn hêmanên çanda xwe ya maddî û manewî derêxîn. Ji strana Kurdî; cil û berg, xanî û navmal, amîretên aşxanê, amîretên çekan, xemla jin û mêran, amîretên çandinê, kele û bajêrvanî, şer û bergirî, têkilîyên jin û mêran, biçûk û mezinan, rêzikên exlaqî û gelek tiştên dî hîn dibîn. Bi rêka stranê em derheqê civaka Kurdî ya klasîk agahîyan werdigirin. Em dibînin ku civaka Kurdî ya klasîk ji çînên wekî mîr û pismîr, axa, pisaxa û torin, ‘eşîr û kirmanc, feqe, mela, qazî û şêx, gundî û bajêrî, Koçer û xwecihan pêkhatîye. Civaka Kurdî bi hemî serûberê xwe ve di nava stranê de cihê xwe digirît. Dîsa em hînî dîwanxane û usûlê revebirina mîr û hakiman dibin.

Girîngtirîn jêderê ziman û edebiyata Kurdî stran e. Çimkî strana Kurdî bi kurdîyeke resen, ciwan û rewan hatîye honandin. Gelek peyv û gotinên ber mirinê bi xêra strana Kurdî ji nemanê rizgar bûne. Herwisa strana Kurdî ji bo standartbûna zimanê Kurdî roleke mezin leyîztîye. Strana di devereka Kurdistanê derkeftî gelek sanahî şîyaye belavî hemî derên Kurdistanê bibît, bêyî pirsgirêkên tegehiştinê. Bo dewlemendkirin û karîgerkirina zimanê kurdî di medya û perwerde û zanistan de roleke mezin ya stranê heye. Ji ber vê yekê jêdereke girîng e bo pêşvebirin û parastina ziman û edebê kurdî. Ji ber nebûna dezgehên perwerdeya Kurdî û lêkolînên dîroka Kurdistanê, Kurdan dîroka xwe bi awayê stranan vegotîye. Gelek leheng û rûdanên dîrokî bi saya stranê di nava milletê Kurd de belav bûne û stran bûye palderek bo zindîmana hestên netewî û parastina hişmendîya kurdbûnê. Em dikarîn bi xêra stranê li ser gelek bîr û boçûnên Kurdan yên derheqê; xweza, jin û mêr, zarok, dîyardeyên xwezayî,

çînên civakê, mirovahî, şer û lêkdan, aştî û pêkvejîn, jîn û mirinê helkevîn. Li Kurdistanê gelek qewm, dîn, mezheb û terîqetên cihê hebûne. Ew hemî pêkve jîyane. Strana Kurdî pêkvejîna van cudahîyan raçavî me diket. Ne tinê derheqê mizgevt, medrese, tekye û xaneqayan herwesa derheqê dêr, kenişt, şanedêr, tewaf, qeşe, reben, şemaşe û civakên wekî Ermenî, Nestûrî, Cuhî, Êzidî, Tirk, ‘Ereb û hwd. jî agahîyan didet.

Bi kurtî heke em bibêjîn strana Kurdî protîpa şexsê Kurd di nava xwe de veşartîye gotineke şaş nîne. Em bi saya stranê dikarîn nasnama Kurdekî ji rêzê derêxîn. Lewra girîngtirîn jêdera civaknasî, derûnnasî, dîroknasî û bawerînasîya civaka Kurd strana Kurdî ye. Çimkî her hêmaneke şexsê Kurd pêk tînît wekî; evîn, mêranî, xweza, xurbet, mirin, civak, bawerî di strana Kurdî de heye. Wekî dawî em dikarîn bibêjîn ku strana Kurdî gelek kûr û derûnî nîne, servekî ye. Lê belê beramberî vê yekê ûtopîk û xeyalî jî nîne. Realîst û rasyonel e.

**Di Strana Kurdî de Şêwaz**

Em dikarîn şêwazê bi kurtî wekî awayê vegotinê binirxînin. Di strana kurdî de şêwazeke giştî heye. Ji stranên berdest em têdigehîn ku hem her bendeke stranê hem jî stran hemî ji sê pêngavên li dû hev rêz dibin, tête honandin. Van hersê pêngavan em dişên wekî; rêxweşî, navdaçûn û encam binavbikin. Di pêngava rêxweşîyê de stran bi teswîrê (*wênekêşî*) destpêdiket. Ev teswîr dibît ku an fîzîkî an jî derûnî bît. Piştî rêxweşîyê pêngava navdaçûnê destpêdiket. Di beşa navdaçûnê de bi berfirehtir behsê mijarê, rûdanê an jî ragihandina hest û boçûnan tête kirin. Piştî navdaçûnê pêngava encamî têt. Di vê beşê de raman an jî boçûna tête xwestin ku bête ragihandin cih digirît. Ji bo baştir têgehiştina li dû hev hatina van pêngavan û honandina stranê me divêt çend nimûneyan bideyn.

Bo strana serbest.

***Rêxweşî***

*Were de lay lo siwaro*
*Ca dilê min dayê dînê rebenê nebûye kûreke ji kûrêd van hed**ada***

***Navdaçûn***

*Îro şerekî giranê lime hatîye kirinê xîveta Şerefxana wêran*
*Li mabeyna herdû giran herdû milan lo herdû c**ada***
*Îro dê bilanê serê min biba qurbanî serê kekê minê Nadir Begê delal*
*Çawanê li serê meydanê li binê meydanê li nava komêd siwarêd neyaran da*
*Hat û qevda simbêlên zerî zer sosinî girt û her b**ada***
*Îro gulêd sêtîran û mawîzeran û eynelîyan*

*Li serê meydanê li binê meydanê têne kekê minê Nadir Begê bi elbika wa bi ser**ada***

***Encam***

*Dê bilanê sala di ber vê salê kuleke ji kulêd xezebê bikevîte nav mala Îsivê Ebdal Begê û Mala Zoro*

*Çawa derbeka risasî dane bejn û bala kekê minê Nadir Begê delal*

*Belê heyfa min dihête li wê heyfê îro ji xwe ra negehişte çi meqsed û çi mir**ada***

*Were de lay lo siwaro heyran*

*Ca dilê min dayê dînê rebenê nebûye kûreka ji kûrêd van ciqs**îyan***

*Îro şerekî giranê lime hatîye kirinê xîveta Şerefxana şewitî*

*Li mabeyna herdû giran herdû cadan lo herdû s**îyan***

*Îro dê bilanê serê min biba qurbanî serê kekê minê Nadir Begê delal*

*Çawanê li serê meydanê li binê meydanê li nava komêd siwarêd neyaran û dijminan*

*Hat û kire qêrîn û van gaz**îyan***

*Belê ser serê kekê minê Nadir Begê delal bûye gijêna gulêd sêtîran û mawîzeran û eynel**îyan***

*Dê bilanê sala di ber vê salê kuleke ji kulêd xezebê bikevîte nav mala Îsivê Ebdal Begê û Mala Zoro*

*Çawanê bi xafil qeda derbeka dane bejn û bala kekê minê Nadir Begê delal*

*Belê heyfa min dihête li wê heyfê termê egîdê mala babê min mabû meydanê li nav komêd van neyar û xwey**îyan***[45]

Dema em hûrbînî berê xwe didene vê benda strana “Kekê Minê Nadir Begê Delal” em hersê pêngavên ku bend pê têne ava kirin dibînin. Di rêza pêşîyê de dilê xwe şibandîye kûrên agirî yên hedadan yanî teswîra derûnî kirîye. Piştî rêza pêşîyê beşa navdaçûnê destpêkirîye û di vê beşê de behsê rûdanekê hatîye kirin. Di rêza dawîyê de jî tiştê ku hez kirîye ragehînît yanî bi mirad û meqseda xwe şanebûna lehengî ve dawî daye benda stranê.

45 Fezledîn, Nêrweyî, *Xiregul, Stranêd Kock û Dîwanan (Lawje),* Çapxana Spîrêz, Dihok, 2011, r. 321.

Bo strana bi kêşe.
*Avkokek têyo, ji ber* ***bêzarê***
*Kevyan b'kelêşin, av bête* ***xwarê***
*Min xwe vexwarî, ji çengê* ***yarê***

*Avkokek têyo, ji ber* ***zozanê***
*Kevyan b'kelêşin, av bêt* ***bincanê***
*Min xwe vexwarî, ji çengê* ***canê***

*Avkokek têyo, ji ber* ***nihala***
*Kevyan b'kelêşin, av bête* ***mala***
*Min xwe vexwarî, j'çengêd* ***delala***[46]

Herwisa di vê benda stranê jî heman pêngav li dû êk hatine avêtin. Di rêza pêşîyê de rêxweşî yanî wênekêşîyeke fîzîkî, di rêza duyê de navdaçûn û di rêza dawîyê jî encam yanî bîr û boçûna tête xwestin ku bête danê heye.

Ji herdu stranên jorî taybetîyeke dî ya şêwaza strana Kurdî derdikevît meydanê. Dema em bala xwe didene stranên jorî em dibînin ku binyadê stranê yek bend e. Ev yek bende bi dubarekirina peyvên cuda ve heman hest û boçûnê radigehînît. Di stranên jorî de yek hest heye lê belê bi guherandina peyvên binê wan reşkirî yanî peyvên serwayê (*kafiye*) pêktînin ve stran hatîye dirêj kirin. Vê şêweye ji bo honandin û jiberkirina stranê roleke hêsanker leyîztîye.

Piştî dîyarkirina şêwaza stranan ya giştî em niha dikarîn derbasî awayên vegotinê bibîn. Ji bo bilindkirina asta hunerî ya stranê pêdivî bi pêgirîkirina çend rêbaz û awayan heye. Taybetî ji bo rengînkirin, dewlemendkirin, ciwankirin an jî xurtkirina rewanbêjîya berhema hunerî û edebî pêdivî bi pêgirîkirina van awayên vegotinê heye. Li ser vê binaxê di strana Kurdî de jî awayên wekî; teswîra xurt, mazmûnên stranan, şibandin û mecaz, bang û dîyalog, kurtvebêjî û lêkhatina peyv û hestan hatine bi kar înan. Dengbêj û hunermendên bi hêz şîyane bi rêka van awayên vegotinê, stran û berhemên xwe karîgertir û mayîndetir bikin.

## Encam

Gelnasî (folklor); zanista li dû rêbazên taybet berhevkirin, vavartin, nirxandin û şîrovekirina her bermayekî maddî û manewî ya gelekî ye. Edebiyata gel dîsîplîneke binbeş ya gelnasîyê ye. Gelê Kurd ku ji ber sebebên taybet ji her tiştekî zêdetir pêdivîyê karîgerkirina zanista gelnasîyê ye. Di destpêka sedsala

46 Kemalê Modayî (Kemal Şimşek).

XXIan ve hinek derfet peydabûne ku îmkana berhevkirin û nirxandinê dane. Lê belê hêj folklora Kurdî bi awayekî zanistî nehatiye lêkolînkirin. Me xwest di vê xebata xwe de li ser strana beşek ji edebîyata gelêrî ya Kurdî lêkolînê bikin. Bi vê meremê me devera Hekarîyan wekî nimûne nirxand.

Wekî di xebata me de dîyar bûyî strana Kurdî de formên ji hev cuda hene. Ev formên cuda dabeşî stranên govend û dîlanan û stranên gazî- dîwankî dibin. Em dikarîn navên van formên di bin babê van herdu beşan de wekî; dûrik, dîlok, lawje, lawik, payîzok, heyranok, şeşbendî, peste, zêmar, laylayê, serêlîk, lorik, medîhe, serê zava û narînk bi nav bikin. Herwesa stranên zarokan û stranên karî jî du beşên girîng in.

Ji alîyê ruxsarî ve strana Kurdî du teşeyên girîng werdigirin; bi kêşe û serbest. Di hinek xebatên vê dawîyê wesa xuya diket ku strana serbest jî dinava xwe de kêşeke xwemal ya Kurdî dihewînît.

Strana Kurdî stranek e xeyalî û ûtopîk nîne. Digel jîyana kurdewerî diguncît. Mirov dişêt hemî rengê jîyanê yê kurdewerîyê tê de peyda biket. Stran hem derheqê jîyan û çanda Kurdan ya klasîk de hem jî derheqê kesayetî û serbora Kurdan wezîfa neynikekê dibînit. Herwesa ji bo parastina zimanê Kurdî û zindîgirtina hizra netewî roleke serekî leyîztîye.

Strana Kurdî bi şêwazekê hatîye honandin ku îmkana jiberkirin û berdewamîbûnê didet. Ev şêwaz li ser sê pêngavên li dû hev rêz dibin ava dibît. Li çavî vê çendê berê wênekêşîyeke fîzîkî an jî derûnî ve dest pê diket. Paşî bi hostayî behsê rûdan an jî mijarê diket. Di encamê de jî hest û boçûna tête xwestin bête ragehandin ve dawî dibît.

---

## Çavkanî


Artun, Erman. *Türk Halk Edebiyatina Giriş,* Kitabevi, İstanbul, 2009, ç. 5, r. 261.

Bavê Nazê, *Ferhenga Têrmên Wêjeyî,* Çapxana Hewar, Dihok, 2012, r. 165.

Cigerxwîn, *Folklora Kurdî,* Weşananên Roja Nû, Stockholm, 1988.

Çelebî, Nezan Newzat- YILDIRIM, Vedat- ATAŞ, Aytekîn G, “Li Muzîka Kurdan a Kevneşopî Nêrîneke Giştî”, *Kovara Zend, Bihar- Havîn, 2008.* (Wer: Davut Özalp).

Dr. Selah Hirorî, *Çend Babetên Dîrokî Di Strana Dîrokî Ya Kurdî Da,* Enstîtuya Kelepûrê Kurdî, Silêmanî, 2004.

Fezledîn, Nêrweyî, *Xiregul, Stranêd Kock û Dîwanan (Lawje),* Çapxana Spîrêz, Dihok, 2011.

Hecî Ce'fer, *Qevdeka Stranên Folklorî, Li Devera Bahdînan,* Enstîtuya Kelepûrê Kurdî, Çapxana Aras, Hewlêr, 2007.

Mistefa Hesen, *Dîlok, Stranên Dirwîn û Dîlanan,* Weşanên Sipîrêz, Dihok, 2005.

Oy, Aydın, "Halkiyat" *TDV İslam Ansiklopedisi,* C: 15, TDV Yayınları, İstanbul, 1997.

Prof. Dr. Şukrîye Resul, *Edebî Folklorî Kurdî,* Dezgay Muzîk û Kelepûrî Kurd, Hewlêr, 2008.

Rêkêş Amêdî, *Heyranokêd Kurdî,* weşanên Sipîrêz, Dihok, 2010.

Salihê Heydo, *Komek Dûrik Ji Folklora Kurdên Suriayê,* Bergê: 3, Enstîtuya Kelepûrê Kurdî, Çapxana Aras, Hewlêr, 2009.

**Dengbêj**

Ebdulqadir Gwîzereşî (Abdülkadîr Kizilkaya): Ji gundê Gwîzereşê ye. 70 salîyê boriye. Niha li Culemêrgê niştecih e.

Fata Seranî (Fatma Ayaz): Ji gundê Seranîyê ye. 75 salî ye. Niha li Wanê niştecih e.

Hecî Haşim Seranî (Haşim Kaplan): Ji gundê Seranîyê ye. 77 salî ye. Dibistana seratayî qedandîye. Niha li Culemêrgê niştecih e. Xanenişîn e.

Hecî Reşo Bilêcanî (Reşît Kaçar): Ji gundê Bilêcanêye. Di 60 salîya xwe de 2013ê çû li ber rehma Xudê.

Kemalê Modayî (Kemal Şimşek): Xelkê Culemêrgê ye. 66 salî ye. Dibistana Navincî qedandîye. Niha xanenişîn e û li Culemêrgê niştecih e. Dengbêjekî jêhatî ye.

M. Salih Gwîzereşî (M. Salih Demir): Ji gundê Gwîzereşê ye. Derdora 65 salîyê ye. Niha li Culemêrgê niştecih ye.

Mela Kerem Seranî (Kerem Sayik): Ji gundê Seranîyê ye. 75 salî ye. Dibistana seretayî qedandîye. Niha li Culemêrgê dijît.

Mela Silêman Tuxîbî (Sûleyman Demir): Ji gundê Tuxîbê ye. 60 salî ye. Dibistana seretayî qedandîye. Niha li Culemêrgê niştecih e.

Mela Tahir Tuxîbî (Tahir Demir): Ji gundê Tuxîbê ye. 52 salî ye. Lîse (Amadeyî) qedandîye. Niha li Mizgefta Melîk Esed ya li Culemêrgê mela ye.

Rehîmaya Cebraîl (Rahîme Öztaş): Ji gundê Gwîzereşê ye. 60 salî ye. Dibistana seretayî xwendîye. Niha li Culemêrgê niştecih e. Kebanîya malê ye.